Şopdara Rastiyê ye
Ronahî
www.ronahi.net/ku/ Hejmar :740 04-Adar- 2020 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Yek ji rêbazên zilma dewleta Tirk, qutkirina ava vexwarinê ye

Tirkiye hewl dide bi her rêbazê zextê li şêniyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bike. Piştî êrîşên hovane û koçberkirina bi sedhezaran, vê carê artêşa Tirk a dagîrker ava vexwarinê li ser bi hezaran şêniyên bajarê Hesekê qut kir.



Ji destpêka çîrûska Şoreşa Rojava ve, Tirkiye hewl dide bi her rêbazê projeya demokratîk a herêmê têk bibe.

**DEWLETA TIRK NIKARÎ ŞOREŞA GEL TÊK BIBE**

Dewleta Tirk nikarî vîna gelê şoreşger têk bibe. Tevî ku çek dan komên çete yên wek Cebhet El-Nusra, "Artêşa Azad" û DAIŞ`ê. Tirkiyê ev çete li ser sînorên xwe kom kirin. Lê ji ber berxwedana gelê herêmê, nikarî siyaseta xwe derbasî herêmê bike.

Pişt re artêşa Tirk a dagîrker bi awayekî yekser mûdexele kir. Leşker û çeteyên xwe şandin Bakur û Rojhilatê Sûriyê da dagîr bikin, şerê gel bikin û şoreşa wan têk bibin.

Destpêkê li gel bêdengiya navneteweyî û piştgiriya hin hêzên herêmî Efrîn dagîr kir, Komkujî kir. Hewl da qada dagîrkirinê fireh bike. Ji ber wê 9`ê Cotmeha 2019`an êrîşî Bakur û Rojhilatê Sûriyê kir. Di encamê de Girê Spî û Serê Kaniyê dagîr kirin û bi sedhezaran mirov dan koçberkirin.

**DESTPÊKÊ AVA BENDAV Û ÇEMAN QUT KIR Û ŞERÊ NE YEKSER**

Di meha Nîsana 2018`an de Tirkiyê avên bendavên Firat û Hiriye li başûr û rojhilatê bajarê Tebqayê qut kirin. Ji ber wê av li ser bi dehhezaran qut bû.

Li gorî qanûnên navneteweyî pêwîst e avên di gelek welatan re derbas dibin bi awayekî wekhev werin parvekirin. Ava çemê Firatê ji Tirkiyê diherike, di Sûriyê re derbas dibe û li Iraqê bi dawî dibe.

Çemê Firatê ava vexwarinê ji milyonan mirovan re peyda dike. Ji parêzgeha Dêrazorê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Reqa û Tebqa ji nava Sûriyê heta bigihe Helebê li bakur rojavayê Sûriyê.

Dewleta Tirk ava çemê Belîx ku di kantona Girê Spî re derbas dibe, berî dagîrkirina bajêr sala 2018`an qut kir. Ev çem bi hezaran hektar ji zeviyên çandiniyê li bakurê Sûriyê av dide.

Çemê Belîx duyemîn girîngtirîn çemê Sûriyê ye. Cotkarên gundewarên bakur û rojhilatê Reqayê û bajarê Girê Spî û tevahiya gundewarê wê zeviyên xwe bi wî av didin.

Dewleta Tirk gelek proje li ser çemê ji bo avdana zeviyan li aliyê Tirkiyê ava kirin û ava wî kom kir. Ji ber wê ava çem li aliyê Sûriyê qut bû.

**STASYONA ELÛK.. TIRKIYE BI QUTKIRINA AVÊ HEWL DIDE ŞÊNIYAN BIDE KOÇBERKIRIN**

Piştî ku Tirkiyê êrîşî bajarê Serêkaniyê kir, stasyona Elok ya rojhilatê gundewarê bajarê Serê Kaniyê topbaran kir. Ji ber wê heta zêdetirî ji xizmetê derket û av li ser zêdetirî 500



sivîlên bajarê Hesekê, navçeya Til Temirê qut bû. Ji aliyekî din ve Rêveberiya Xweser hişyarî dabû ku wê ji ber wê kerasat çêbe.

Hêzên Rûsyayê gelek caran çûn stasyonê da kermand karibin biçin wir û stasyonê bixebitînin. Lê ji hêla artêşa Tirk ve hatin astengkirin. Lê werşeyên sererastkirinê xwe gihandin stasyonê. 23 bîr ji bingeha 30 bîr li stasyonê sererast kirin.

24`ê Sibatê artêşa Tirk karmend ji stasyonê derxistin û stasyon rawestand. Bi vê yekê av li ser bajarê hesekê qut kir. Ji ber wê aloziyek mirovî mezin li bajêr çêbû.

## Li Endîwarê ji bo çandiniyê beraz xetereke mezin in

Li derdora gundê Endîwar yê herêma Dêrikê, berazên kovî li nava erdan belav bûne û zerereke mezin didin çandiniyê. Cotkar jî ji vê ne rihet in.

Artêşa Tirk a dagîrker ev pênc sal in nahêle şêniyên gundê Endîwarê nêzî erdên xwe bibin. Ji ber wê liv û tevger li hin erdan nemaye. Ev jî dibe sedem ku li derdora gundê Endîwerê yê herêma Dêrikê beraz bi awayekî zêde derkevin.

Erdên ku şênî nikarin nêzî wan bibin li derdora 7 hezar donim e, ev jî dibe sedem ku berazên kovî derkevin holê.

Di dema niha de, belavbûna berazên kovî jiyana şêniyên naxe xeterê, lêbelê bandorê li erdên nêzî gund dikin. Şênî dibêjin, beriya niha jimara



berazên kovî kêm bû, lê ji ber ku herêm vala bû jimara wan zêde bûye.

Endamê Saziya Çandinî û Sewalkariyê şaxê herêma Dêrikê Selah Hemza diyar kir ku derbarê belavbûna berazên kovî li nava erdan de, şêniyan gilîname pêşkêş kirine û got, em amadekariyê dikin ku komîteyekê rêkin herêmê û ji bo dûrixistina berazan ji erdên çandiniyê çareyekê peyda bikin. ***QAMIŞLO-NEJBÎR OSMAN***

## 550 mamosteyên zimanê kurdî bawernameyên xwe girtin

Komîteya Fêrkirin û Perwerdê ya kantona Hesekê bawernameyên zimanê kurdî li 550 mamosteyên peymangeha Şehîd Roza Cûdî ya li Dirbêsiyê qedandîn, belav kirin.

Komîteya Fêrkirin û Perwerdê ya kantona Hesekê, li yarîgeha Dirbêsiyê şahiyek organîze kir û bawernameyên zimanê kurdî li 550 mamosteyên peymangeha Şehîd Roza Cûdî sala 2015, 2016 û 2017'an qedandîn, belav kirin.

Di merasîmê de bi sedan



mamosteyên zimanê kurdî yên navçeya Dirbêsiyê, saziyên li bajar û gundewarên wê amade bûn.

Di merasimêde, piştî rêzgirtinê bi navê Komîteya Rêveberiya Dibistanan a kantona Hesekê Raman Hesaf diyar kir ku ziman nasnameya gel û hebûna wan e. Ji ber wê girêdana bi zimanê dayîkê ve erkek e ku divê her kes lê xwedî derkeve.

Mamoste Hesaf wiha axivî "Em spasiya tevayiya mamosteyên ziman ên di danîna kevirê bingehê zimanê kurdî de ked dayîn û nifşên perwerde bi ziman û çanda xwe dibînin, dikin."

Hevserokê Bûroya PYD'ê ya Dirbêsiyê Suleyman Xelîl jî diyar kir ku dewleta Tirk di siyaseta qirkirina gelê Kurd, çand û zimanê wî de israr dike û got, "Me êrîşên dewleta Tirk ên ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku yekser dibistan û peymangeh kirin hedef dîtin."

## Li Zanîngeha Dortmûndê Konferansa Zimanê Dayikê

Kurd Akadê, bi hevkariya Enstîtûya Kurdî ya Dusseldorfê, Yekitiya Mamosteyên Kurd (YMK) û Zanîngeha Dortmûndê, bi sernavê Zimanê Dayîkê, Pirzimanî û Cihêrengî konferansek lidar xist. 65 kes tevlî konferansa li zanîngeha Dortmûndê bûn.Di beşa yekê ya konferansê de ku xwendekara beşa mamostetiyê Nalîn Erdînç moderatoriya wê kir, Dr. Renate Deluçhi gotara xwe ya bi navê 'Duzimanî; zanîn û ziman' û Serokê YMK'ê Abdulkadîr Ulumaskan jî gotara xwe ya bi navê 'Sînor, Zehmetî û Pêwistiya Çalakbûnê', pêşkêş kirin.



## Dermanê tayê dibe ku li dijî vîrûsa koronayê bê bikaranîn

Hat gotin 'Chloroquîne' ku li dijî tayê yek ji dermanên sereke ye, dibe ku ji bo tedawiya Covîd-19 were bikaranîn.

Li gorî encama lêkolînê yên pisporên Çînî ya di kovara BîosScîence de hatî weşandin, ev dermanê ji bo ku tedawiya tayê tê bikaranîn, herwiha vîrûsa koronayê jî baş dike. Vê encamê dispêrin ceribandinên klînîk yên li Çînê hatîn kirin.

Dîrektorê Esntîtûya Têkoşîna Dijî Enfeksiyonê ya Marsilaya Derya Spî, Dîdîer Raoult, ku ji AFP'ê re axivî, got, ev encam di ceribandinên klînîk de yên li Çînê hatîn kirin, derketiye holê. Raoult herwiha got em dizanin ku Chloroquîne di tûpa cam de vîrûsa koronayê baş dike û lêkolîna li Çînê vê piştrast dike.

Li gorî Raoult bi encama ku bi ceribandinên klînîk hatiye piştrastkirin vîrûsa koronayê dibe ku bibe enfeksiyona ku ''herî bi erzanî tedawiya wê bibe.''

Ceribandinên li Çînê li nexweşxaneyên Wuhan, Pekîn û Şangayê ku vîrûs lê derketiye holê hatiye kirin. Li gorî pisporên Çînî, li ser ji sedî zêdetir nexweşî bi kar anîne û ev derman ji bo ku pêşî li berbelavbûna vîrûsê bigire, bandora wê kêm bike, encamên baş dane.




---



# Partiya Paşrojê ya Sûriyê li Reqayê kongerya xwe ya yekê li dar xist


*Partiya Paşrojê* ya Sûriyê kongreya ya yekê li Reqayê li dar xist. Her wiha beşdaran got, divê ji aloziya Sûriyê re bi garantoriya navdewletî çareyeke siyasî were dîtin. ***R-4***

## Şewata li Îmraliyê bi zanabûn e- *RÛPEL-5*



Şopdara Rastiyê ye
Ronahî
www.ronahi.net/ku/ Hejmar : 740 04-Adar- 2020 Rojnameya Siyasî û Çandî


## Li Idlibê şer êdî ne yê wekaletê ye



Li Idlibê şer giran dibe. Piştî ku 3 balafirên rejîma Sûrî ji aliyê dewleta Tirk ve hatin xistin û Sûrî 3 balafirên keşfê yên dewleta Tirk xistin, êdî şer ket qonaxeke din û êdî ne rast e ku şer weke şerê çeteyan û rejîmê bê bi navkirin.***R-4***

*RÛPEL-7*

# Rojev Yekîtiya Kurdan e



Hevserokê nû yê PYD'ê Enwer Mûslim, ji bo serdema nû, armancên sereke yên partiya xwe wiha rêz kirin: Yekîtiya Kurdan, li ser hîmê destûreke demokratîk ji krîza Sûriyê re çaerseriya siyasî û têkoşîna li dijî dagîrkeriyê. Mûslim, herwiha diyar kir ku PYD partiya çareseriyê ye û projeya wan projeyeke demokratîk a ji bo tevayiya gelên herêmê ye.

*RÛPEL-4*



## Armanca dewleta tirk tinekirina gelê kurd e

Ji roja dewleta Tirk ava bûyî heta weke niha, di serî de Kurd, ji bo tinekirina gelan, ji kuştin û girtinê heta talan û qirkirinê serî li her rêbazê daye. Digel tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, niha jî agahiya şewata darîstana girava Îmralî belav bû. Vê agahiyê gelê Kurd xist nava fikar û gumanan. ***R-6***



## ´Govend ruhê zindî yê Kurdan e´

Folklora Kurdî bi dewlemendî, rengînî û dîroka xwe ya ku xwe dispêre dengbêjiyê tê naskirin. Mamosteyê Govendê Îsmaîl Altox dibêje, dema mirov wate û rola govendê zanibe û hewl bide fêm bike, dikare di hunera Kurdî de rol bigire û bide fêmkirin. ***R-7***

PENa KURD

## PENa Kurd ji malbatên kedkarên hunerê re sersaxî xwest

Têkildarî koça dawî ya Nivîskar, helbestvan û weşanger Zeynel Abîdîn Xan, Hunermend Seîd Yûsiv, Dr. Ciwan Heqî (Batû) PENa Kurd li ser malpera xwe metna sersaxiyê weşand. ***R-7***

## Rêveberiya Xweser: Em dikarin koçberên Idlîbê pêşwazî bikin

*Rêveberiya Xweser* a Bakur û Rojhilatê sûriyeyê careke din bang kir ku dikarin sivîlên ji ber şer koçber dibin pêşwazî bikin. ***R-5***

## Kampa waşokanî li koçberan xwedî derket

Êrîşa 9`ê Cotmeha 2019 a dewleta Tirk ku hê jî li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê berdewam e, bû sedema koçberiya 300 hezar sivîlên herêmên Serê Kaniyê û Girê Spî. ***R-6***



## Mîhrîcana 5. ya Wêje û Hunera Jinê dest pê kir

Bi durişma "Jin rehjena çandê ye" Mîhrîcana 5. ya Wêje û Hunera Jinê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê dest pê kir. ***R-7***



# Li Ewropa çalakiyên ji bo Ocalan didomin

**Ji bo agahîgirtina ji Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û rakirina tecrîdê, li gelek welatên Ewropa çalakî hatin lidarxistin.**




Ciwanên Kurd li balefirxaneya Strasboûrgê ya Fransayê çalakiyek li dar xistin. Ciwanan bi durişma 'Destûrê nede tecrîdê' çalakî li dar xistin û posterên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan vekirin.
Di çalakiyê de hate xwestin ku parêzerên Ocalan biçin hevdîtinê û agahiyên zelal werin bidestxistin. Çalakî bi qasî saetekê dewam kir û bi sloganên 'Bijî Serok Apo' bi dawî bû.
Kurd û dostên wan ên li bajarê Elmanya Koln û derdora wê jî bi heman armancê çalakiyek li dar xistin.
Li paytexa Swêd Stockholmê jî Kurdistanî û dostên wan li Qada Sergelstorgê hatin bal hev û ji bo rakirina tecrîda li ser Ocalan çalakî li dar xistin.

## Li ser sînorê Sûriye-Tirkiyê li rojhilatê Kobanê dewriyeya hevpar dest pê kir



Polîsên leşkerî yên Rûsyayê bi hevkariya hêzên dewleta Tirk a dagirker, dewriyeyeke hevpar li rojhilatê Kobanê li ser sînorê Sûriye-Tirkiyê pêk anî.
Dewriye ji 4 panzêrên Rûsyayê û 4 jî yên dewleta Tirk, her wiha 2 helîkopterên Rûsyayê pêk tê.
Dewriye ji gundê Xerîb dest pê kir û li gundên Bozteb, Qeremox, Cîşan, Xirabîsana Jorîn, Xirabîsana Jêrîn û Bexdikê gerî. Ev gund nêzî sînor in. Piştre dewriye ji heman gundan re vegerî û li gundê Xerîb bi dawî bû.
Dê dewriye tenê 5 km derbasî xaka Sûriyê bibe.

## Li Tirbespiyê 2 xebatkarên kehrebeyê jiyana xwe ji dest dan û yek jî birîndar bû



Roja duşema borî li navçeya Tirbespiyê ya girêdayî kantona Qamişlo dema werşeyên sererastkirinê pirsgirêka kehrebeyê ya li ser Rêya Siyahî ya bakurê navçeyê sererast dikir, 2 xebatkaran di encama kehrebegirtinê de jiyana xwe ji dest dan û yek jî birîndar bû.
Xebatkarên bi navên Rênas Qasim û Sehil El-Berho jiyana xwe ji dest dan û Mehmûd El-Nasir birîndar bû.

## Nûçegihanê MA'yê Sayilgan hat girtin

Nûçegihanê Ajansa Mezopotamyayê (MA) Îdrîs Sayilgan ji bo rewşa koçberên berê xwe dan Yewnanistanê bişopîne çû ser sînorê Edîrneyê lê hate destgîrkirin.
Nûçegihanên MA'yê Sayilgan û Nacî Kaya ji ber biryara "qedexeya derketina derveyî welat" a têkildarî wan, tên darizandin. Her du nûçegihan bi rêya SEGBÎS'ê beşdarî rûniştinên darizandinê bûn.
Sayilgan ku Dadgeha Cezayê Giran a Mûşê 8 sal û 3 meh cezayê girtîgehê lê birî ye, bi rêya SEGBÎS'ê tevlî 2'emîn Dadgeha Edliyeyê ya Erzîromê bû.
Heyeta dadgehê biryara girtina Sayilgan da. Heyeta dadgehê îdîa kir ku li gorî "delîlên" li ber dest ev biryar hatiye wergirtin û diyar kir, eger nûçeyên li herêmê hatin amadekirin di



dema îtirazê de weke delîl bên pêşkêşkirin, wê bên nirxandin.
Rojnamevan Îdrîs Sayilgan şandin Girtîgeha Girtî ya Tîpa F a Edîrneyê.

## Erdogan bi hêviya agirbestê ye û Pûtîn di şerkirina li dijî terorê de bi israr e



Serokkomarê Tirkiyê Recep Tayyîp Erdogan ji gefên xwe yên li Sûriyê paş ve kişiya û piştî danûstandinên bi serokê Rûsyayê Vladimîr Pûtîn re, hêvî kir ku agirbest çêbe. Herwiha Rûsyayê piştrast kirk u danûstandin pêk hatine û Pûtîn diyar kir ku di "şerkirina li dijî terorîstan de" bi israr e.
Serokkomarê Tirkiyê Recep Tayyîp Erdogan diyar kir ku ji bo nirxandina rewşa Idlibê wê hempîşeyê xwe yê Rûsyayê Vladimîr Pûtîn roja Pêncşemê li Moskova bibîne.
Erdogan di axaftina xwe de wiha got: "Ezê roja Pêncşemê serdana Moskova bikim. Emê rewşa Idlibê nîqaş bikin. Herwiha bi hêvî me ku piştî danûstandinan agirbestek çêbe."
Li aliyekî din berdevkê Kremlînê Dmitriy Peskov got leşkerên Rûsya û Tirkiyê li Sûriyê her dem di nava têkiliyan de ne û danûstandinên Vladimîr Pûtîn û Recep Tayyîp Erdogan wê rewşa Idlibê diyar bikin.
Peskov li ser planên dewleta Tirk ên berfirehkirina operasyonên li Idlibê jî wiha got: "Leşker her dem di peywendiyan de ne, jê girîngtir jî wê bala wan li ser danûstandinên di navbera Pûtîn û Erdogan de be."
Peskov wiha axivî: "Rûsya li gorî peymaa Soçî di aştiya xaka Sûriyê û piştgiriya Şamê ya şerkirina li dijî terorîstan de bi israr e û serokê Rûsyayê wê bi helwesta xwe ve girêdayî be."
Dewleta Tirk Yekşema borî destpêkirina operasyona leşkerî li dijî hêzên rejîmê ragihandibû. Piştî wê jî hêzên rejîmê bi piştgiriya asîmanî ya Rûsyayê bajarê Seraqibê xist destê xwe.

## Minbiciyan bi pêmana 8 Adarê bajar xemiland

Bi pêmana Roja Jinan a Cîhanê bi durişma "Têkoşîna me azadiya me ye û berxwdana me serkeftina me ye", Meclisa Jinên bajarê Minbicê kolan, ketina bajêr û çerxeriya şehîdan xemilandin.

Bi pêmana 8 Adarê Meclisa Jinan a bajarê Minbicê û gundewarên wê bi hevkariya Meclisa Jinan a Ciwanan û Rêveberiya Sivîl a Demokratîk dest bi xebata pêşwaziya rojê kir.
Endama Meclisa Jinan a bajarê Minbicê ketina bajêr, kolanên sereke, çerxeriya başûrê bajêr û çerxerêya Jinan a li rojhilatê bajêr xemilandin. Meclisa Jinan alên Meclisa Jinan û wêneyên şehîdan daleqandin.
Her wiha pankartên bi nivîsa "Bi hatina hewayê biharê û vekirina gul û çîçekan em 8 Adarê li jinan pîroz dikin. Hêviya serketinê ji jinan re dixwazin, Şoreşa jinan negire nava xwe ne pêkan e bi ser bikeve û bi berxwedana jinan wê doza gelan bi ser bixe" hatin vekirin.





# Li Kobanê pîşesazê çanda kevnar diparêze

**Mihyedîn Şamliyan yê ji bajarê Kobanê, pîşeya biriqandina cewher û çêkirina tizbiyan ji bavê xwe girtiye. Her wiha berhemên dîrokî restore dike û diparêze da winda nebin.**

*KOBANÊ-SAMIR OSMAN*

Tevî pêşketinên di gelek waran de, gelek kesan pîşeyên xwe berdane û berê xwe dane karên din da pereyên zêde bi rehetî bi dest bixin, Mihyedîn Şamliyan hê pîşeyê ji bavê xwe girtî didomîne. Şamliyan cewheran dibiriqîne û tizbiyan çêdike. Li rex vê pîşeyê berhemên dîrokî restore dike û diparêze.
Şamliyan gelek berhemên dîrokî yên ku dîroka wan vedigere gelek serdeman parastine. Bi rêbazeke ku zirarê nede wan û teşeya wan neguhere çêdike.
Li cem Şamliyan gelek şûr hene ku dîroka wan vedigere serdema Selcuqiyan. Her wisa xencerên girêdayî gelan û serdemên cuda, peyker, kelûpelên malan ên kevn û dîrokî.
Her wiha li cem Şamliyan gelek berhemên dîrokî yên xweşik hene, mîna tabloyeke mûzayîk, li gorî texmîna wî dîroka wê vedigere çanda Kurdên Êzîdî beriya 400 salî. Nîşana cilên Kurdî yên resen di daweta mîrekî yan jî şêniyekî wê demê de ye.
Şamliyan tizbiyan ji kevirê misk çêdike, tevî kevir ji cureyên din. Girêdayî wê dibêje, gelek tişt li cem min in ku ew çand ber bi windabûnê ve diçe. Eger em neparêzin wê helbet winda bibe. Şamliyan bang li civaka Kurd kir ku cilên xwe yê kevnar biparêze.





## Mîhrîcana 5. ya Wêje û Hunera Jinê dest pê kir

Bi durişma "Jin rehjena çandê ye" Mîhrîcana 5. ya Wêje û Hunera Jinê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê dest pê kir.
Mîhrîcan bi sponsoriya Desteya Çand û Hunerê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê û Rabîteya Jinên Rewşenbîr li navenda Çand û Hunerê ya Mihemed Şêxo ya bajarê Qamişlo dest pê kir.Jin ji tevayiya Bakur û Rojhilatê Sûriyê, xwendekarên jin yên beşa wêje ya Zanîngeha Rojava, rewşenbîr, endamên saziyên civaka sivîl û bi dehan welatî beşdarî mîhrîcanê bûn.
Hola mîhrîcanê bi alavên kevin ên çanda tevayiya civakan hatibû xemilandin.
Piştî rêzgirtinê axaftina destpêkê ya mîhrîcanê ji aliyê endama rêveber a Rabîteya Jinên Rewşenbîr Ahîn Mihemed ve hat kirin. Ahîn bi xêrhatina beşdaran kir û spasiya kesên ji bo mîhrîcanê ked dayîn kir.
Her wiha bernameya mîhrîcanê eşkere kir.
Piştî axaftinan helbestvan Anahîta Sîno, Darîn Gewriyê û Jînda Mihemed helbest li ser şoreş, welat, dayika şehîd û berxwedana Serêkaniyê gotin.
Herwiha berhemek mûzîkê ji aliyê Tevgera Kevana Zêrîn hat pêşkêşkirin.
Gelek komên hunerî û kevneşopî berhemên xwe pêşkêş kirin, ji wan Koma Stêrk a Kevneşopiya Kurdî, Koma Înana a Kevneşopiya Suryan, Koma Kevana Zêrîn a Mûzîkê û Koma Vejandina Kevneşopiya Erebî.
Roja yekemîn a mîhrîcan bi vekirina pêşangeheke folklorî bi dawî bû.
Mîhrîcan wê bi belavkirina xelatan bi dawî bibe.

## PENa Kurd ji malbatên kedkarên hunerê re sersaxî xwest

Têkildarî koça dawî ya Nivîskar, helbestvan û weşanger Zeynel Abîdîn Xan, Hunermend Seîd Yûsiv, Dr. Ciwan Heqî (Batû) PENa Kurd li ser malpera xwe metna sersaxiyê weşand.

PENa Kurd têkildarî koça dawî ya Nivîskar, helbestvan û weşanger Zeynel Abîdîn Xan, Hunermend Seîd Yûsiv, Dr. Ciwan Heqî (Batû) sersaxî xwest. Di metna sersaxiyê de wiha hat gotin: "Helbet her yek ji wan hêjaye bi serê xwe kitêb li ser bên nivîsandin, ev lehengên Kurdistanê di gel astengî û bêderfetiyan mîraseke giranbiha ji milletê xwe re hiştin. Em minnetdarên ked û xebatên wan ên bêhempa ne û wê her di dilê welat û milletê xwe de bijîn.

**Di berdewamiya metna sersaxiyê de wiha hat gotin:**

"26.02.2020, di vê rojê de Kurdistanê sê kesayetên xwe yên payebilind winda kirin. Her sê jî bi xem û xeyalên welatê xwe, li ji dervî welêt çavên xwe dan hev; Zeynel Abîdîn Xan, Seîd Yûsiv û Dr. Ciwan Heqî (Batû). Em wek PENa Kurd pir xemgîn in û em dibêjin; bila serê milletê me, bi taybetî serê malbatên wan sax be, cihê wan bihuşt be.

Nivîskar, helbestvan û weşanger Zeynel Abîdîn Xan, ji ber fikrê welatparêziyê li Tirkiyeyê gelek caran hatiye girtin û dû re çûye Almanyayê. Bi dehan berhem û wergerên wî hene. Endamê PENa Kurd Zeynel Abîdîn Xan, di heman demê de edîtoriya kovar û weşanxaneyan jî kiriye.

Hunermend Seîd Yûsiv, ji Rojava ye, li Qamişloyê ji dayik bûye, lê bi deng û tembûr û berhemên xwe di dilê Kurdan de cihekî taybet ava kiriye û wek Şahê sin'etkaran hatiye qebûlkirin. Derdora 50 salî xizmeta muzîka Kurdî kiriye. Wî jî li Stenbolê çavên xwe li jiyanê girt, lê li ser wesiyeta wî wê li Qamişloyê hat definkirin.

Dr. Ciwan Heqî (Batû) ji Şirnexê ye, zanîngeha tibê li Bûlgaristanê qedandiye. Pişt re derbasî Swêdê bûye. Dr. Ciwan li gel doktoriya xwe bi karê nivîskariyê re jî mijûl bûye. Em minetdarên ked û xebatên wan ên bêhempa ne û wê her di dilê welat û milletê xwe de bijîn."

## ´Govend ruhê zindî yê Kurdan e´

Folklora Kurdî bi dewlemendî, rengînî û dîroka xwe ya ku xwe dispêre dengbêjiyê tê naskirin. Mamosteyê Govendê Îsmaîl Altox dibêje, dema mirov wate û rola govendê zanibe û hewl bide fêm bike, dikare di hunera Kurdî de rol bigire û bide fêmkirin.

Îsmaîl Altox wiha dibêje: "Folklor û govend zanîstek e ku bi gel tê naskirin. Di heman demê de folkolor neynîka civakê ye. Folklora Kurdî bi dewlemendî, rengînî û dîroka xwe ya ku xwe dispêre dengbêjiyê tê naskirin. Folklora Kurdî hem ji aliyê stiranên gelêrî, mûzîk, govend û dîlan, hem ji aliyê wêne, helbest, çîrok û şano ve pir dewlemend e. Govend beşeke girîng ya çanda Kurdî ye û di heman demê de liv û tevgereke muzîkî ye. Rîtmeke bedenî ya wisa ye ku hestên mirovan tevan dertîne holê. Çawa ku yên dilîzin zewqê jê digirin, yên temaşe dikin jî, keyfeke mezin jê distînin. Li gorî herêman gelek rengên govendê hene, di hina de xort û keç tev de, di hina de keç tenê, di hina de jî xort tenê direqisin. Rengê her govendekê navekî wê heye û li gorî herêman nav jî ji hev cuda ne."



# Kampa waşokanî li koçberan xwedî derket

Êrîşa 9`ê Cotmeha 2019 a dewleta Tirk ku hê jî li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê berdewam e, bû sedema koçberiya 300 hezar sivîlên herêmên Serê Kaniyê û Girê Spî.



***Dilîn EHMED/Ronahî Qamişlo***

Ji ber tang û topên dweleta Tirk, bi hezaran malbatên Serê Kaniyê û Girê Spî, neçar man mal û milkên xwe li bişt xwe bihêlin.
Ji bo pêkanîna pêwîstiyên van koçberan, Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê, bi hevkariya Heyva Sor a Kurdî 24`ê Cotmeha 2019 li bajarokê Tiwêna yê 12 km, li rojavayê bajarê Hesekê, Kampa Waşokanî vekir.
Li Kampê jiyaneke aram heye. Ji bo perwerdeya zarokan dibistan hatiye avakirin, ji bo pêdiviyên jiyanê jî dikan hene. Ji bo mijara tenduristiyê jî Heyva Sor a Kurdî li wir dimîne. Herwiha ji bo aramiya kampê, bi şev û roj asayîş li ser kar e. Digel vê rewşa aram xwesteka koçberan ew e ku, di demeke kurt de vegerin bajarê xwe.

**JI BO PÊKANÎNA PÊDIVIYAN EM DIXEBITIN**

Rêveberê Kampa Waşokanî Xalid Xilo diya kir ku, heta ji wan tê bi derfetên heyî, pêdiviyên koçberan pêk tînin û wiha got: "Bi awayekî giştî rewşa li kampê aram û baş e. Heta niha pirsgirêkeke zehmet nehatiye pêşiya me. Destpêkê xwesteka malbatan ya mana li kampê tinebû. Lê piştî ku xelkê dît kamp xizmeta wan dike, êdî roj bi roj jimar zêde bû. Destpêkê 30 malbat bûn, niha 1435 malbat in. Jimara kesan jî 8695 e. Xelkê li kampê ji Serê Kaniyê ne. Yên xwe didin ber bare van malbatan rêveberiya xwser û heyva sor a kurdî ne. Herwiha ji hundir û derve jî hinek alîkarî ji me re hat."

**JI BO ÇARESERKIRINA PIRSGIRÊKAN EM XEBATEKE ZÊDE DIKIN**


Xalid got, ji bo çareserkirina pirsgirêkan em li kampê xebateke zêde dikin û axaftina xwe wiha domand: "Malbatên ji gundên aliyê çiyê hatîn, yên aram, em dixwazin wan vegerînin gundên wan û li şûna wan, malbatên ji Serê Kaniyê bi cî bikin."
Li ser pergala nava kampê jî Xalid diyar kir ku her 20 kon girêdayî komînekê ne. Hem ji bo alîkariyê, hem ji bo derfeta kar, ew komîn berpisyar e. Yên bixwazin li derveyî kampê kar bikin, em derfetê didin wan jî."
Rêveberê Kampa Waşokanî Xalid Xilo, axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Tevî vê êrîş û dagîrkeriya bi serê gelê me yê Serê Kanyê û Girê Spî de hatî, li ber xwe dan û dev ji xaka xwe bernedan. Bi vê berxwedana xwe nîşan dan ku xwediyên vê xakê ne û heta dilopa xwîna xwe ya dawî wê li ber xwe bidin."

## Şerê Sûrî derbasî qonaxek nû bû

***Farûk SAKIK***

Dema ku sala 2011'an şerê navxweyî yê li Sûriyê dest pê kir, Tirkiyê jî xwest tevlî vî şerî bibe.
Bi xwedîderketina li komên Îxwanî Misilmîn dest pê kir.
Erdogan dixwest xeyalên xwe yên Osmaniya nû, bi vê komê bide destpêkirin û wisa jî kir.
Ev komên selefî (Di serî de El Nûsra û Ehrar El Şam), Hema, Hums, Xûta û Heleb di bin kontrola wan de bûn.
Rejima Sûrî û Rûsya ji bo van hêzan ji van deveran derxin li aliyekî erîş dikirin li aliyekî din jî li riyên dîplomasiyê digeriyan û Tirkiye hat bîra wan.
Tirkiye bi rejima Sûrî re dijminantî dikir. Di demeke wisa de li ser navê rejima Şamê, Rûsya bi Tirkiyê re têkildar bû. Bazarê dest pê kir. Herêma ku di destê hêzên selefî de bûn diviya bihatina valakirin û li hev jî kirin.
Ji Cereblusê dest pê kirin. Cerablus, Bab û Ezaz wê bibûna bedêla valakirina Helebê.
Dema ev dever radestî Tirkiyê kirin, çete ji bajarê Helebê derxistin ber bi van herêman ve anîn.
Lê dixwestin ku hêdî hêdî hêzên selefî li navendekê kom bikin.
Dema xwestin Hama, Hums û Xûta jî werin valakirin, dewleta Tirk Efrîn pêşnîyar kir û hat qebûlkirin.
Efrîn hat dagîrkirin û ew çete hatin li Efrîn û Îdlîbê bi cih bûn.
Roj hat ev komên selefî ku di polîtîkayên Rojhilata Navî yên Tirkiyê de aktorên qadê bûn; li Îdlibê asê bûn.
Rejima Şamê û Rûsya bi Efrînê razî bûn. Lê diviya ku Idlib were çareserkirin. Idlib devereke stratejîk bû, herkesî hesabên xwe li ser vî bajarî dikir.
Rusya wê ji dagîrkeriyê re bêdeng bima û Tirkiye jî, ji bo statûya Idlibê wê li rê û rêbazekê bigeriya. Bi vî awayî jî li hev kirin.
Li Soçî û Astanayê civîn hatin lidarxistin. Lê daxwaziyên dewleta Tirk zêde dibûn; heremên Kurdan tev dixwestin. Li Enqerê dema ku Amerîka destûra dagîrkeriya Serê Kaniyê û Grêsipî da, şerteke wan jî hebû; diviya Kobanê neyê dagîrkirin.
Piştî vê dagşrkeriyê, di navbera Rusya û Tirkiyê de bazareke nû çêbû. Vê carê li Soçî bûn. Di vê hevdîtinê de Îran tinebû. Dewleta Tirk bi Israr di bedêla Idlibê de Kobanê û heremên Bakur û Rojhilatê Sûrî dixwestin. Li hev nedikirin.
Rejima şamê jî êdî xwedî kart û qozeke mezin bû. Hêza xwe kom kiribû û dixwest mixalifan û çeteyên girêdayî dewleta Tirkiyê bi temamî ji holê rake. Firsend ev firsend bû.
Di demeke wisa de, Tirkiye peymana Soçî danî aliyekî. Tirkiye dizanibû eger ev keleha Idlibê ji destê wan here û çete tev werin tasfiyekirin, êdî wê nikaribe li Rojhilata Navî bibe xwedî ti statûyan.
Ji bo ku vê kelehê biparêze dest bi gefan kir. Roj jî dabû. Digot, heta dawiya Sibatê artêşe Sûrî venekişe, emê dest bi şer bikin. Esas niyeta xwe ya dagîrkirina Kurdistanê û xwedîderketina li çeteyan jî vedişart.
Rûsya jî herî dawî di daxwiyaniyeke xwe de digot; Tirkiye, Peymana Soçiyê ku Tirkiye û Rûsyayê li ser statûya Grê Spî, Serêkaniyê û Îdlibê li hev kiribûn, binpê dike.
Lê roja (27 Sibat 2019) ku dewleta Tirk wek destpêka şer destnîşan kiribû, tiştek din bû. Berûvajiyê vê yekê Sûrî şer da destpêkirin.
Di 27ê Sibatê de bi balefiran erîşî baregehên dewleta Tirk kirin. Li vê baregehê hem eskerên Tirk û di heman demê de çete jî hebûn.
Zaiyateke mezin dan dewleta Tirk û çeteyên wê ku hê jî esas jimara windahiyên wan nehatiye destnîşankirin.
Bi vê operasyonê şerê Idlibê derbasî qonaxek nû bû.

## Siyaset nîne, nîq, şantaj û teşqele hene!...



**Medeni FERHO**

'Em tev Kujer'in", ev navê pirtûka Jean Paul Sartre e, dibêje: "Kolonyalîstî sîstemek e". Ev rast e, kolonyoalîstên serdema me tav bûne kujer, yên misilman bi navên Qur'anê, yên Mesîhî bi navê xaçparêziyê komkujiyan dikin!... Desthilatdar jî, ji Xwedayê mezin bêhtir, xema berjewendiyan dixwin..
Şerê 3. yê cîhanê, bi rengekî balkêş dewam dike; siyaset jî bûye teşqele, bêbextî, şantaj û nîq!... Desthilatdarên cîhanê, bi giştî yan bûne provakator, yan jî kujer in.
Min berî niha, di nivîsa "Şerê Cîhanê û Ocalan" de, gotibû: Yek lîderê cîhanê, ji bo rawestandina şer, pêkanîna aştî û çareseriyê hewldanan nake, tenê Ocalan nexşeriya aştî, çareseriya pirsgirêkan dike." Ez gotina xwe dubare dikim.
Provakatorî û şerxwazî, piştî komploya navneteweyî, li dijî Ocalan, li dijî Hereketa Azadiya Kurd û gelê Kurd, dest pê kir. Piştî dagîrkeriya Emerîka li Iraqê, (20 Adara 2003), eşkere bû ku, dewlet-netewe nikarin pirsgirêkên civakan çareser bikin. Bihara Gelan (Ereban) dest pê kir, lê hêzên hegemonîk, ji bo ku sîstema kolonyalîst bidomînin, hêzên paramilîter û çete kirin nava tevgerê.
Hêzên hegemonîk, di şerê yekemîn yê cîhanê de, kolonîkirina Roma û dewşirmetiya Osmaniyan mînak girtin û dewlet-netewe ava kirin. Di her du sîsteman de faşîzm heye, li Ewropa dîkatorên weke Hîtler, Mussolînî, Franko, Salazar û Pînoshet, li Rojhilata Navîn jî, paşa, nîv paşa û monarşikên bêexlaq derxistin holê.
Ev desthilatdar, siyaseta xwînê dimeşînin, bêbextî, nîq, teşqele û şantajê dikin, hêzên paramîlîter û çete berdane nav ser û guhên gelan.
Tirkiyê, li darî çavên cîhanê, çete û artêşa xwe bi hev re şandin Bakurê Suriye, komkujî kirin, çekên kimyewî bi kar anîn, demografiya herêman guhertin... Ev sûcên mirovahiyê ne. Rêveberiyên herêmê, saziyên mafên mirovan û saziyên doktorên li herêmê, belge radestî Neteweyên Yekbûyî, saziyên mafên mirovan yên navneteweyî tevan kirin. Gelek çavdêrên siyasî û mafên mirovan, Erdogan û El Başîr ku li Darforê komkujî kir û sûcloyî hatibû dîtin û Saddam ku li Başûrê Kurdistanê bi ayetên Qur'anê komkujî kirin û ji ber van sûcan hat darvekirin, Erodgan û Hîtler weke hev bi nav kirin.
Hêzên hegemonîk, qanûnên sîstema zalim kapîtalîzmê kirin pratîkê, li hemberî sûcên Tirkiyê û çeteyên wê dengê xwe nekirin. Piştî Efrîn, Serê Kaniyê, Girê Spî û hwd. li Idlibê jî, leşkerên Tirk û çete li gel hev hatin kuştin. Rûsya got; "me nizanîbû leşkerên tirk li wir hene". "Wir", "ewder"a ku tê gotin, cihê çeteyan e.
Duyemîn xal; Serokkomarê Tirkiyê, vekirî got, "em ê leşkeran bişînin Libya". Hem leşker, hem leşkerên bi pere û çete şandin Libya. Desthilatdarên cîhanê dengê xwe nekirin. Dema ku di Konseya Ewlekariya Neteweyên Yekbûyî de, çend dewlet, ji bo agirbestê ketin nava tevgerê, hêzên super hegemonîk, daxwazî weto kirin. Ev jî tê wateya ku desthilatdarên cîhanê şer dixwazin
Eger desthilatdarên cîhanê şer bixwazin, li cîhanê siyaset namîne, hiqûq, demokrasî û edalet namîne. Lîderên cîhanê kişûmat, bi rengên cuda gelan terorîze dikin, li çar aliyên cîhanê şer dikin. Li gel artêşan, hêzên paramilîter û çeteyan, vîrîsa korona jî li dijî gelan bi kar tînin.
Balkêş e, Ocalan ne serokê dewletekê ye, lîderê Hereketa Azadiya Kurd e, di bin tecrîdê de ye, lê aştiyê dixwaze, ji bo aştî û çareseriya pirsgirêkan nexşeriyan amade dike. PKK, ne desthiladara dewletekê ye, Hereketa Azadiya Gelê Kurd e, lê pêşengiya azadiya gelan û mafê gelan dike. PYD, ne desthilatdara dewletekê ye, lê, ji bo çareseriya pirsgirêka Suriyê, riya sêyemîn, federalîzmê pêşniyar dike.
Rûsya, Tirkiye û Îranê peymana Sykes-Pîcot û Konferansa San Remo berteref kirine. Lê PKK, bê ku sînoran parçe bike, xaka dewletan dagîr bike, çavkaniyên hundir û dînamîkên gelê Kurd bi kar tîne, federalîzma ku bingeha demokrasiya gelan e, derdixe pêş.
Piştî ragihandina "plana sedsalê" ya Trump, ku agirê li Rojhilata Navîn geştir kir, Îsraîl, yekemîn car şandeyek şand Qeterê.
Qeter, hevkara Trkiyê ye û terora li herêmê destek dike. Hêvî ew e ku Îsraîl, weke Emerîka, ne ji bo geşkirina şer, ji bo aştî û siyaseteke aqîlane şandibe Qeterê. Her cara ku şandeyeke Emerîka tê Tirkiyê, şer dijwartir dibe.
Welatên Dostên Suriye, 68 welat bûn, destîniya Suriye bi destê Tirkiye, Rusya û Îranê ve berdane. Gelo, "dostên Suriye", çima li biryarên civîna 24 Sibata 2012an xwedî dernakevin, yekparetiya Suriyê û federalîzma ku bingeha demokraisyê ye naparêzin?
Ji bo parastina cîhanê û gelan, ne tenê Ocalan, PKK û PYD, divê gelên cîhanê, wek gelên li bakurê Suriyê, dînamîkên xwe bikin nava tevgerê û careke din bihara gelan bidin destpêkirin.



# 'Ji tenduristî û ewleyiya rêber Ocalan dewleta Tirk berpirsyar e'

Navenda Lêkolînan Û Parastina Mafên Jinan a Sûriyê, diyar kir ku dewleta Tirk ji tenduristiya rêber Abdullah Ocalan berpirsyar e û bang li rêxistinên hiqûqî yên navneteweyî û Komîteya Pêşîgirtna li Işkenceyê ya Ewropayê CPT kir ku li hemberî işkenceya fikrî, derûnî û bedenî ya li dijî rêber Ocalan, berpirsiyariya xwe pêk bînin.

Navenda Lêkolînan û Parastina Mafên Jinan a Sûriyê li ser şewata li girava Îmralî ku rêber Abdullah Ocalan lê girtî ye, daxuyaniyek bi raya giştî re parve kir.
Daxuyanî wiha ye:
Ji bo mirovayiyê bi giştî û jinan bi taybetî, rêber Abdullah Ocalan fedekariyeke mezin kir. Di şert û mercên herî zehmet de piştgiriya tevgera rizgariya jinan kir ku bigihîne asta zanabûnê û mafên xwe bi dest bixin. Her wiha ji bo pêkanîna edalet û wekheviya her du zayendan, kar kir û banga jiyana hevbeş a di navbera tevayiya netewe, ol û mezheban de bi riya fikr û felsefeya neteweya demokratîk kir. Rêber Ocalan bi komployeke navneteweyî 15`ê Sibata 1999`an dîl hat girtin û şandin girava Îmraliyê da dûrî malbat, heval û parêzerên wî bixin û ji sala 2011`an ve tecrîdeke giran ku li ser tê meşandin.
Di dawiya daxuyaniyê de hat gotin, "Dewleta Tirk ji tenduristî û ewleyiya rêber Ocalan berpirsiyar e û got, em bang li CPT û rêxistinên din ên girêdayî wê dikin ku zextê li delweta Tirk bikin ku rewşa Ocalan eşekere bike û destûra hevdîtinê bide malbatê û parêzerên wî.

## `Jinên Rojava ji jinên cîhanê re bûne mînak'

Jina enternasyonalîst Bêrîvan Qaracox 8'ê Adarê li jinên cîhanê pîroz kir. Bêrîvan got, "Jinên Rojava ji jinên cîhanê re bûne mînak. Bi taybetî berxwedana şervanên YPJ'yî ku serkeftin bi dest xistin."
Bi pêmana 8`ê Adarê Roja Jinên Kedkar ên Cîhanê endama entersyonalîst a Komîteya Hemleya Jin Rojava diparêzin a Kongreya Star Bêrîvan Qaracox ku ji Britanyayê ye teqez kir ku 8`ê Adarê xwedî girîngiyek dîrokî ye.
Bêrîvan diyar kir ku jin li tevahiya cîhanê ji bo ku asta têkoşînê li hemberî zihniyeta mêr ya serdest mezin bike kar dike. Herwiha ew roj bi pîrozî da nasîn.
Bêrîvan di nava gotinên xwe de wiha got: "8`ê Adarê hê di bîra me de zîndî ye. Divê têkoşîna me di vê rojê de ji bo paşrojeke ku tevahiya jinan li her derê diparêze be. Roja cîhanê ya jinê ji tevahiya jinên entersyonalîst û berxwedêr in."



Girêdayî sedema hebûna xwe li Rojava Bêrîvan wiha got: "Ji ber zulma pergala kapîtalîst a mêrê serdest ez ji Britanyayê hatim vir. Welatên Ewropî çawa ku behsa xwe dikin ne wisa ne. Em ne azad in."
Endama entersyonalîst a Komîteya Hemleya Jin Rojava diparêzin a Kongreya Star Bêrîvan Qaracox bang li tevahiya jinên Rojhilata Navî û cîhanê kir ku asta têkoşîna li hemberî zinhiyeta mêrê serdest mezin bikin û got, Berxwedan û têkoşîna me yek e. Mil bi mil emê bigihîjin azadiyê."... *QAMIŞLO-ŞÎNDA EKREM*

## Jinên Ereb: Li hemberî bûyera şewata li Îmralî emê bêdeng nemînin

Bi armanca naskirina rewşa tenduristiya rêber Ocalan, jinên Ereb yên kantona Şehbayê bang li rêxistinên mirovî kirin û diyar kirin ku wê li hemberî bûyera şewata li Îmralî bêdeng nemînin.
27'ê Sibatê dewleta Tirk ragihand ku li girava Îmralî ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan 21 sal in lê dîlgirtî ye, şewat derketiye. Jinên Ereb ên kantona Şehbayê bûyera şewatê şermezar kirin û banga domandina çalakiyên ji bo eşkerekirina rewşa Ocalan kirin.
Welatiya bi navê Emanî Ebdullah li ser mijarê wiha got: "Em kiryarên dewleta Tirk ên beramberî rêber Ocalan şermezar dikin û piştî şewata li girava Îmralî em daxwaziya diyarkirina rewşa wî dikin."
Emanî diyar kir ku wek jinên Ereb wê heta rizgariya Ocalan çalakiyên xwe bidomînin û bê deng nemînin. Emanî di dawiya axaftina xwe de bang li rêxistinên mafên mirovan kir ku bi ser dewleta Tirk de biçin ku parêzer serdana rêber Ocalan bikin.



Welatiya bi navê Hêvîn Elo jî da xuyakirin ku bi zanebûn agir bi girava Îmraliyê xistine û armanca dewleta Tirk ew e ku helwesta gel û asta yekîtiya wan bi xwîşk û birayên wan ên Kurd re nas bike.
Welatiya bi navê Rîfah Elûş jî wiha got: "Ji bo rêber Ocalan emê çalakiyên xwe bidomînin.
*ŞEHBA-LÎNDA ŞÊX*

## Kongreya Star bi pêmana 8`ê Adarê li hemberî faşîzmê bang li jinan kir



Komîteya Amadekar a Kongreya Star a Roja Jinên Cîhanê roja 8`ê Adarê li jinên Bakurê Sûriyê û cîhanê tevan pîroz kir.
Bi pêmana 8`ê Adarê Roja Jinên Cîhanê Kongreya Star li kampa Waşûkanî û Şehbayê daxuyanî da. Di daxuniyê de 8`ê Adarê li tevayiya jinan hat pîrozkirin.
Endam, rêveberên sazî û desteyên kantona Efrîn û Şehbayê tevlî xwendina daxunaniyê bûn. Jinan wêneyên Rêber Abdullah Ocalan, wêneyên şehîd Hevrîn Xelef, dayîka Eqîde Osman û ala Kongreya Star, hildan.
Daxuyanî wiha ye:
"Bi navê Komîteya Amadekar a çalakiyên 8'ê Adarê, em Roja Jinên Cîhanê li tevayiya jinên cîhanê, bi taybetî jinên Sûriyê, pîroz dikin. Di serî de, em şehîdên pêşeng ên jin ku mohra xwe li rûpelên dîroka têkoşîna azadiya jinê dane wek Roza Luksemburg, Klara Zetkin, Leyla Qasim, Bêrîtan, Zîlan, Sara, Ligrîn, Barîn û Hevrîn bîr tînin. Di heman demê de em berxwedana zindanan silav dikin. Di serî de ramangerê neteweyî Abdullah Ocalan ku zêdetirî 20 salan e li girava Îmralî di tecrîdeke girankirî de tekoşîn dike silav dikin.

## Minbiciyan bi pêmana 8 Adarê bajar xemiland

Bi pêmana Roja Jinan a Cîhanê bi durişma "Têkoşîna me azadiya me ye û berxwdana me serkeftina me ye", Meclisa Jinên bajarê Minbicê kolan, ketina bajêr û çerxeriya şehîdan xemilandin.
Bi pêmana 8 Adarê Meclisa Jinan a bajarê Minbicê û gundewarên wê bi hevkariya Meclisa Jinan a Ciwanan û Rêveberiya Sivîl a Demokratîk dest bi xebata pêşwaziya rojê kir. Endama Meclisa Jinan a bajarê Minbicê ketina bajêr, kolanên sereke, çerxeriya başûrê bajêr û çerxerêya Jinan a li rojhilatê bajêr xemilandin. Meclisa Jinan alên Meclisa Jinan û wêneyên şehîdan daleqandin.
Her wiha pankartên bi nivîsa "Bi hatina hewayê biharê û vekirina gul û çîçekan em 8 Adarê li jinan pîroz dikin. Hêviya serketinê ji jinan re dixwazin, Şoreşa jinan negire nava xwe ne pêkan e bi ser bikeve û bi berxwedana jinan wê doza gelan bi ser bixe" hatin vekirin.



## Jin li Şehbayê ji bo Ocalan meşiyan

Koordînasyona Kongrya Star a Efrînê, li ser şewata li Îmraliyê li Şehbayê meşek li dar xist.
Bi însiyatîfa Kongreya Star bi hezaran şêniyên herêma Efrînê li Kantona Şehbayê daketin qadan û banga sehkirina rewşa Ocalan kirin.
Xwepêşandêran wêneyên Ocalan û pankartên bi zimanê Erebî û Kurdî rakirin û gotin em terka fikrên Ocalan nakin.
Xwepêşandêr li kolanên sereke yên navçeya Ehdas geriyan û ber bi gundê Mirata yê Kantona Şehbayê ve meşiyan.
Xwepêşandêran sloganên şermezarkirina tecrîda li ser Ocalan avêtin û banga azadiya Ocalan kirin.
Li gundê Mirata meş veguherî mîtîngê û li ser navê Kongreya Star a Kantona Efrînê Sûreya Hebeş axivî. Hebeş soza berdewama têkoşîna ji bo azadiya Ocalan de da û wiha axivî: "Selametiya Rêber Ocalan ji bo me pir girîng e. Ji bo wê em daketin kolanan û em banga eşkerekirina tenduristiya Rêbertiyê dikin.
Li ser navê Yekîtiya Jinên Azad ya Kantona Şehbayê Melik Hisên jî diyar kir ku komploya li dijî Rêbertiyê hê dewam dike û bêdengiya navdewletî ya li hemberî tecrîda li ser Ocalan şermezar kir. Herwiha bang li welatiyan kir ku asta têkoşîna xwe bilind bikin, dakevin qadan û çalakiyan li dar bixin.

# Muslim: Hedefa me çêkirina yekîtiya Kurd û li Sûriyeyê çareserî ye

Hevserokê nû yê PYD'ê Enwer Muslim armancên sereke yên partiya wan di serdema nû de wiha rêz kirin: Yekîtiya Kurdan, li ser hîmê destûra demokratîk çaerseriya siyasî ya krîza Sûriyê, têkoşîna li dijî dagîrkeriyê.

Hevserokê nû yê PYD'ê Enwer Muslim ji ajansa nûçeyan ANF'ê re axivî û got, diviya kongreya me dawiya sala 2019'an çêbe, lê ji ber êrîşên dewleta Tirk û çeteyên wê kongre hat paşxistin.

Muslim diyar kir ku ji gelek herêmên Rojava û Bakurê Rojhilatê Sûriyeyê delege tevlî kongreyê bûne û got rojeva sereke bûyer û geşedanên li Sûriyê û Rojava yên 9 salên dawî bûn.

Muslim axaftina xwe wiha domand: "PYD partiya çareseriyê ye. Projeya partiya me projeyeke demokratîk a ji bo tevayiya gelên herêmê ye. Gelek biryar hatin girtin, ev biryar jî ji bo serastkirina kar û xebatên me ne. Herwiha yek ji mijarên rojeva kongreya me ew bû ku bi riya dîplomasiyê ji bo darizandina bi dehhezaran çeteyên DAIŞ'ê bû, ku em dixwazin li Rojava bên darizandin. Mijareke din jî ya sereke yekîtiya Kurdan bû. Lewre yekîtiya Kurdan ji bo PYD'ê pir girîng e. Helwestê me di kongreyê de zelal bû. Bê şert û merc tişta bikeve ser milê me li Sûriyê û Rojava em pêk bînin."


Di dewama nirxadinên xwe de Hevserokê PYD'ê Enwer Muslim wiha got: "Divê gelên Sûriyê; Kurd, Ereb, Tirkmen, Asûrî-Suryan, Xiristiyan tev bi hev re bi hêzên Sûrî-Sûrî têkoşîn bikin. Wek partiyeke di binê sêwana Rêveberiya Xweser de û partiyeke civakî emê di her warî de xizmeta civakî ya gel bikin

Enwer Muslim bal kişand ser hevdîtinên bi aliyên Kurdî re û got, divê ji bo Sûriyeke demokratîk em bikarin bi hev re bixebitin û li ser vî bingehî divê partiyên siyasî tev, ji bo pêkanîna xwestekên gel û yekîtiyê fedakariyê bikin.

Enwer Muslim herwiha bal kişand ser siyaseta Tirkiyê ê got, "siyaseta şaş encamên şaş bi xwe re tîne. Tirkiye di aliyê siyasî, civakî, aborî û dîplomasî de di nava krîzê de ye. Ji bo Rûsya û Emerîka jî got, her du hêz jî hêzên mezin in û di çareserkirina nakokiyên li Sûriyê de roleke mezin dikeve ser milê wan.

Hevserokê PYD'ê Enwer Muslim bal kişande ser helwesta Başûrê Kurdistanê û ji bo helwesta wan a yekîtiya Kurdan keyfxweşiya xwe anî ziman.

Herî dawî Muslim bal kişand ser rola Rêberê Gelê Kurd a ji bo aştî û azadiya gelan û got, " Tecrîdeke mezin li ser Birêz Ocalan heye. Daxwaziya me ew e ku berî gavekê hevdîtin pê re bê kirin



**ENWER MUSLIM KÎ YE?**

Enwer Mulim li bajarê Kobanê yê Rojava hatiye dinê. Piştî qedandina Fakûlteya Hiqûq a Zanîngeha Helebê demeke dirêj li Kobanê parêzerî kir. Bi destpêkirina Şoreşa Rojava re bû Serokê Meclîsa Rêveber a Kantona Kobanê. Di berxwedana şerê Kobanê de cih girt û yek ji wan kesan bû ku digot "Kobanê wê ji DAIŞ'ê re bibe goristan." Herî dawî Hevserokê Meclîsa Rêveber a Herêma Firatê bû.

## Partiya Paşrojê ya Sûriyê li Reqayê kongerya xwe ya yekê lidar xist



Partiya Paşrojê ya Sûriyê kongreya ya yekê li Reqayê li dar xist. Her wiha beşdaran got, divê ji aloziya Sûriyê re bi garantoriya navdewletî çareyeke siyasî were dîtin.

Partiya Paşrojê ya Sûriyê bi durişma ´Sûriyeke demokratîk, ne navendî, xurtkirina Rêveberiya Xweser û geşkirina QSD'ê´ kongreya xwe ya yekê li hola El-Tac a bajarê Reqayê li dar xist.

Endamên saziyên sivîl, leşkerî, rûspî û şêxên eşîrên Reqa, herwiha endamên partiyê beşdarî kongreyê bûn.

Di kongreyê de ji rêveberên Meclisa Sivîl a Reqayê Qasim Mihemed wiha axivî: "Baweriya gelê Sûriyê bi çareseriya siyasî heye. Niha jî Partiya Paşrojê ya Sûriyê vê bi fikrên xwe dike da Sûriyeke nemerkezî, pirreng û demokratîk ava bike."

Pişt re Endama Meclisa Giştî ya Partiyê û hevserokatiya meclisa sivîl a Reqayê perspaktîvên rêxistinî û siyasî yên partiyê xwendin. Herwiha diyar kirin ku partiyê nûnertiya siyasî ya rast a gelê Sûriyê ku welatê wan bûye qada şerê herêmî û navdewletî girtiye ser milê xwe.

Rapora salane ya partiyê ji aliyê serokê partiyê şaxê Reqayê Abdullah El-Şiblî ve hat xwendin. Di raporê de behsa dozên siyasî li qada Sûriyê, êrîşên dewleta Tirk yên ser xaka Sûriyê, şer û dozên her diçe kûrtir dibin, kir.


Di dawiyê de Ehmed El-Salim daxuyaniya qedandina kongreyê xwend û misogerî li ser pêşxistina partiyê, belavkirina fikrên wê li gorî xizmeta yekitiya xaka Sûriyê, kir.

Kongre bi nêrînên beşdaran ku divê çareyeke siyasî ji aloziya Sûriyê re bi garantoriya navdewletî were dîtin, bi dawî bû.



## Li Idlibê şer êdî ne yê wekaletê ye

Li Idlibê şer giran dibe. Êdî ne rast e ku şer weke şerê çeteyan û rejîma Sûrî were bi navkirin. Ji ber ku dewleta Tirk û Sûrî pir eşkere şer dikin. Heye ku di vî şerî de Rûsya jî cihê xwe eşkere bike. Jixwe Rûsya di şer de heye, lê cihê xwe fermî nake. Piştî ku 2 balafirên rejîma Sûrî ji aliyê dewleta Tirk ve hatin xistin û Sûrî 3 balafirên keşfê yên dewleta Tirk xist, êdî şer li Sûrî ket qonaxeke din. Jixwe serleşkerê dewleta Tirk Akar nav li şer kir û weke mertalê buharê bi nav kir. Li aliyê din dewleta Tirk ji bo vî şerî bike hewara xwe digihîne NATO'yê û li aliyekî din jî xwe davêje ber lingê Pûtîn. Serokkomarê Tirk Erdogan ku wê li ser mijara Idlibê 5'ê Adarê serdana Moskowayê bike, ji bo destê xwe xurt bike beriya serdanê alîkarî ji NATO'yê xwest. Wezîrê Parastinê yê Tirk jî navek li êrişa dagirkeriyê ya li Idlibê kir. Wezîrê Parastinê yê Tirk Hûlûsî Akar diyar kir ku ew naxwazin bi Rûsyayê re werin hemberî hev û got, "Nêt û armanca me nîne ku em bi Rûsyayê re werin hemberî hev. Bendewariya me ji Rûsyayê ew e ku êrişên rejîmê rawestîne û vekişe sînorê mutabaqata Soçiyê."



## Dewleta ku mirovan dike meymûn

Qasim ENGÎN

Bi sosret û matmayîneke mezin em dibînin çawa civakeke bi rûmet ber bi meymûnbûyînê ve dibin.

Tişta balkêş ew e ku; kesekî birçî û pariyek nanê xwe yê xwarinê nîne, bûye koleyê xerîze û ajoyên xwe; xwe azad dibîne û bi erîşa ser gelan wek îro li Îdlîbê dibe, kefxweş dibe.

Kesayetî û civakeke wiha di rastiya xwe de bi dewletê re bûyê yek. Pir rehet e ku di nav kesayetî û civakeke wiha de sîxûr û mûxbir werin pêşxistin. Ji ber ku edî kes û civakek wiha bûye perçe û amûrekî herî bikêr yê dewletê. Ev dewlet eger dewleteke faşîst bibe, wek di dema Hîtler de dibe madeya xam ya faşîzmê.

Ev çawa dibe? Rêbaza vê hesan e. Mirovan biperçîqîne, bêdeng bike, bitirsîne û pey re jî bi nexweşiya netewperestî, olperestî, cînsperestî zanîstperestiyê bixapîne, manîpûle bike. Û mirovekî ku bi her awayî ji xepandinê re vekirî înşa ango ava bike!

Çawa? Bi harkirina ajoyên civakê. Di esas de herkesî, lê di cewher de jî ciwanên keç û xort ji xebatên siyasî û civakî de dûr bixe! Bila tenê serfkirinê ango mezixandinê (serfkirinê) bifikirin. Bila tenê xerîze ango ajoyên xwe bifikrin. Ji bo wê jî li Êspanya stadyumê fûtbolê bi sedhezaran hatibûn avakirin û bi şahiyên wek Toreo's ango Gulaşa Ga'yan ciwanan ji xwe dûr bixe.

Dema xwe de Hîtler û Franko niha jî Erdoxan bi heman tiştî îcar tenê ne bi futbolê, bi rêzefîlman, bi hûnera geşkirinê, bi nexweşiya netewperestiyê, olperestiyê û her wiha avakirina dijminên sexte, civak tê xepandin. Di encamê de digel ku ew bi xwe bûye muhtacê her tiştî û herî jêr de jiyanêkê dijî bêdeng e. Hêna rastir nafikre ku dengê xwe bilind bike.

Ev di rastiya xwe de veguhestina mêjiyan e. Veguhestina mêjî, ne ew e ku mirov li ser maseyan dirêj bikin û di amelîyatan derbas bikin, na veguhstina mêjiyan ew e ku xisleteke nû di wan de bidin avakirin. Dema mirov wek faşîstan lê tê, dest bi fikirîna weka wan dike. Ango di rewşeke wiha de faşîst gihîştine armancên xwe û kerî û meymûnkirina civakê temam bûye. Armanca faşîstan tam jî ew e ku, biherike nava hişê mirovan, hişmendiya wan areste bike, vîna wan bişkîne, wan teslîm bigire û li gorî xwe feraseta netewperestî şiklekî bide wan.

Şerê Taybet Şerê ku; Yek "Bi îstîsmarkirina lewaziya hêza ku ew pê re şer dikin di milê siyasî, aborî, civakî û moral ve ye. Du; denetima ser kesên ku ew pê re şer dikin. Sêyem jî; bi pêkanîna bandorên bi israr ên li ser raman, kelecan, meyl û lebatan; şkandina hêz û azweriya wî ya şer û berxwedanê, bi xerakirina moral pêkanîna hilweşîna wî ya manewî û bi şiyarkirina hesta tirsê, şkandina wêrekiya wan" e. Mabest çi ye: Mabest ew e ku; yên dijberê xwe bitirsîne û bixapîne. Yê ku ditirse, dibe hewcedar û yê ku dixape jî bêçarê dimîne.

Bi vî awayî hêza ku şerê derûnî ferz dike, digihêje derfeta ku xwestekên xwe pêk bîne. Heke civakek were tepisandin û bêçare were hiştin, ew civak dibe kerî û bi hêsanî dikare were çêrandin ango ajotin. Hemû dîktator vê hedef dikin. Mirovên ku tenê bixwin, vexwin û li pey xerîzêyên xwe bikevin, mirovên êdî yên serfkirinê ne.Kesayeteke wiha êdî gelek caran bê navber ji ber bûye perçeyek keriya ku tê ajotin, bêdeng e. An jî bûye meymûnê ku herkes dikare yarî û tevzên xwe pê bike. Ma ji wêdetir ketin heye?



# Şewata li Îmraliyê bi zanabûn e

Dr. Cewad El-Bîdanî

Di raporên rêxistinên navneteweyî de behsa binpêkirinên hikumeta Tirk ên li dijî dijberên wê tên kirin. Li ser kesekî nayê veşartin ku gelek bûyerên kuştinê bi awayekî veşartî li dijî hinek rojnamevan û kesayetên xwedî fikr pêk hatine. Nêrînên wan ji perspektîfên rejîma Tirkiyê û siyaseta wê ya dîktatorî cuda ne. Yek ji mînakên berbiçav jî rewşa têkoşerê navneteweyî Abdullah Ocalan e. Di girtîgeha yekkesî de li giraveke dûr de, yek ji rêbazên li dijî ronakbîrê mezin tê kirin e. Gelo çima dewleta Tirk van zextan li Ocalan dike û sedem çi ne? Her tim me digot fikrê Abdullah Ocalan dibe hedef. Tirkiye her kesê xwedî fikr dikuje. Hincet û behaneyan diafrîne ji bo ku têk bibe û vîna wî bişkîne. Ji bo wê jî zexta derûnî bi kar tîne. Ev hewldaneke ku têkoşer dev ji fikre xwe berde. Dixwaze tovê Ocalan çandî bikuje, lê ne di ferqê de ye ku fikrê Ocalan gihîştiye têkoşerên cîhanê.

Piştî ku Tirkiye ket ferqa asta bandora têkoşer Ocalan, têkoşer Ocalan wek kaxizeke zexte li ser alîgirên wî bi kar anî. Da ku tawîzan ji wan bigire. Piştî ku nikarî zextê li Ocalan bike û neçar bike ku dev ji fikr û nêrînên xwe berde, agir bi daristanên Îmraliyê xist. Eger em bêjin agir ne bi zanabûn e, gelo armancên Tirkiyê ji hiştina Ocalan di wê girtîgehê de çi ne? Tevî ku şewat nêzî girtîgehê ye, çima Tirkiye nahêle parêzer pê re bicivin û rewşa wî bizanin? Pergala Erdogan siyasetên şaş dimeşîne. Dibe ku bibe sedema nakokiya li Tirkiyê û cîhanê. Lewre Ocalan berî ku Kurd be bûye kesayetek nanveteweyî.

Ez dibêjim gelê Kurd û tevayiya azadîxwazên li cîhanê baş ketine ferqa siyasetên pergala Erdogan û rêbazên çewisandinê. Ew baş têgihiştine ku baweriya Abdullah



Ocalan çandî bi van rêbazan tine nabe.

## Armanca dewleta Tirk tinekirina gelê Kurd e

Darîn SILê/Ronahî Qamişlo

Ji roja dewleta Tirk ava bûyî heta weke niha, di serî de Kurd, ji bo tinekirina gelan, ji kuştin û girtinê heta talan û qirkirinê serî li her rêbazê daye. Digel tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, niha jî agahiya şewata daristana girava Îmralî belav bû. Vê agahiyê gelê Kurd xist nava fikar û gumanan.

Berpirsa Saziya Malbatê Şehîda ya Herêma Cizîrê Hêvî Seyid, li ser şewata li Îmraliyê ji rojnameya me re wiha axivî: "Girtina Serokatiyê komployeke navneteweyî bû. Destê gelek dewlet û hêzan tê de hebû. Dewleta Tirk bi girtina Serokatiyê dixwest Kurda bişkîne û bêdeng bike. Lê bi ramanê Serokatiyê gelê me bi ser dikeve. Erê Serokatî di nava çar dîwaran de ye, lê fîkir û felsefeya wî azad in û ji gelên herêmê re bûne rehber. Dewleta Tirk çi dike bila bike wê ti carî nikaribe Kurdan bişkîne. Niha jî bi şewata li Îmralî dixwaze me bêdeng bike. Lê em hemû li ser piyan in, ti carî nawstin û heta agahî ji serokatiyê neyê em nasekinin."



Hêvî Seyid axaftina xwe wiha domand: "Wek jin em azadî û mafê xwe di şexsê Serokatiyê de dibînin. Berê jin bindest bû, tenê jina malê bû. Dengê wê dernediket, lê bi saya fîkr û felsefeya Serokatiyê jinan xwe û mafê xwe nas kirin. Niha jî di her qada jiyanê de jin kar dikin û di karê xwe de serkeftî ne."

Berpirsa Saziya Malbatê Şehîdan ya Herêma Cizîrê Hêvî Seyid axaftina xwe wiha qedand: "Ez bang li gelên herêmê dikim ku ji bo girtina agahiyekê ji Serokatyê tev dakevin qadan."



Endamê Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Salih Yûsif Hisên jî, li ser şewata li Îmraliyê ev nirxandin kir: "Em dewleta Tirk şermezar dikin. Rêberê me ne kesek e, felsefeyek e. Ji bo azadiya mirovan, li hemberî faşîzim û dîktatoriyê têkoşîn dike. 21 sal in rêberê me di zîndana Îmraliyê de di tecrîdeke giran de ye. Dewleta Tirk dixwaze gelê me bêhêvî bike. Lê em dibêjin em şagirtên Rêber APO ne, em qet ji riya Rêber û şehîdên xwe venagerin."

Salih Yûsif Hisên axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Em bang li li gelên blindest dikin ku li rêberê xwe xwedî derkevin. Çimkî heta rêberê me azad nebe em jî azad nabin."

## Rêveberiya Xweser: Em dikarin koçberên Idlîbê pêşwazî bikin

Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê sûriyeyê careke din bang kir ku dikarin sivîlên ji ber şer koçber dibin pêşwazî bikin.

1500 malbatên ji şerê li Idlibê reviyayîn, ketin herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Rêveberiya Xweser jî bi derfetên kêm li kampan bi cih kirin, pêdiviyên wan ên tenduristî û xwarinê pêk anîn.

Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê sûriyê bi daxuyaniyekê careke din bang kir ku dikarin sîvîlên ji ber şer direvin pêşwazî bikin.

Di daxuyaniyê de wiha hat gotin: "Bi kûrbûna aloziya mirovî ya li Idlibê ji ber şerê li wir û bandora wê li sivîlên di rewşeke xirab re derbas dibin, ku bû sedema pêla koçberiyeke mezin, hevkarî, ked û tevgereke girîng ji bo sivikkirina azarên wan, pêwîst e.

Berî niha jî Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê û QSD'ê wek parçeyek ji erk û berpirsiyariya xwe, ragihandibûn ku amade ne, erka xwe ya mirovî pêk bînin. Di vê derbarê de em careke din ji xelkê xwe yên Idlibê re dubare dikin ku em amade ne pêşwaziya wan li gorî derfet û rewşa xwe bikin. Tevî ku jimareke mezin gihîşt herêmên me û em li wan xwedî derketin."

Lê belê ji ber pirbûna koçberan -ku bi serhezaran in- û ji ber dorpêça herêmê û girtina dergehê El-Yeirûbiyê bi biryara navneteweyî û ji ber kêmbûna daneyên ku ji saziyên NY'yê bi riya Şamê di dergehê re tên, hê jî gelek astengî hene.

Zêdetirî hezar û 500 malbatî ji bajarê Idlibê berê xwe dan herêmên Rêveberiya Xweser. Rêveberiya Xweser kampên taybet ji bo koçberan ava dike û alîkariyên mirovî û tenduristî bi awayekî dorveger, belav dike."

## Rûsya rê dide Erdogan



Zekî BEDRAN

Di qeyrana Idlibê de ji ber bêhelwestiya Rûsya Sûriye ber bi parçebûnê ve diçe. Rûsya ji Tirkiyê xwest bi peymana Soçî ve girêdayî bimîne û çeteyên weke El Qaîde bêbandor bike. Lê Tirkiyê tersê wê kir. Li şûna lewazkirina El Nusra û El Qaîdeya navê xwe guhertî, parastina wê û berdevkiya wê kir. Wisa kir ku El Nusra piraniya Idlibê bixe destê xwe. Bi behaneya ku wê trajediya mirovî derkeve, El Nusra û çeteyên din veşartin û xebitî wan ji rojevê derxe.

Her du aliyan jî dizaniya ka aliyê de çi dike. Pûtîn Erdogan hema hema neçarî xwe kir, ji Tirkiyê berjewendiyên mezin bi dest xistin û xebitî li hemberî Emerîka û NATO bi kar bîne. Lê di dawiyê de hat dîtin ku li herêmên Erdogan dagîr kirîn, rêveberiya El Qaîde û Ixwanî tên avakirin û amadekarî tê kirin ku hin herêmên Sûriyê bi ser Tirkiyê ve bên kirin. Li hemberî vê rewşê ber bi Idlibê ve dest bi pêngavekê kirin. Armanc ne ew bû ku Tirkiyê bi tevayî ji Sûriyê derxin. Dixwestin bi bidestxistina riya M4 û M5 qada tevgera çeteyan teng bikin. Operasyonên hatîn destpêkirin bandora wan çêbû. Derdora Helebê hat paqijkirin. Seraqib hat bidestxistin. Riya Şam-Heleb ji çûnhatinê re vebû.

Tirkiyê ku dît çeteyên li derdora wê nikarin li ber xwe bidin, bixwe hêzên leşkerî şandin û çek û cebilxane dan wan. Bi vî awayî tevlî nava şer bû. Tirkiye li şûna ku li xalên çavdêriyê bimîne, bi çeteyan re li derdora xwe belav bû û bi hev re ketin êrîşê. Ji bo ku sînorê Tirkiyê nîşanî wê bikin bedel pê bidin dayîn, li leşkerên wê xistin. Ji ber ku qada hewayî li ber Tirkiyê girtî bû, çeteyan nikarî xwe bigirin û Tirkiye jî pêş ve nediçû. Ya rast, itibara Erdogan kêm bûbû, di nava çeteyan de bêbawerî belav bûbû û êdî ji hev diketin. Çawa ku rewşa Tirkiyê li Sûriyê lewaz bûbû, li hundir û derve jî dest ber bi çûna jêrê ve kiribû. Ji bo wê Erdogan xeter da ber çavê xwe û êrîşên xwe domandin. Herwiha zor da Rûsya. Diyar bû ku wê NATO û Emerîka destekê bidin Tirkiyê. Van hêzan nedixwest Rûsya li Sûriyê serdest bibe û desthilatdariya Esed xurt bibe. Ji bo ku Erdogan muhtacî wan bibe ji bo wan ev firsetek bû û li benda wê bûn. Bi vî awayî wê Tirkiye ji Rûsya dûr biketa û ber bi çerxa wan ve biçûya. Li ser israra Tirkiyê, bi behaneya kêmkirina tengezariyê Rûsya qada hewayî vekir û destûr da ku Tirkiye balafirên xwe yên bêmirov bi kar bîne. Vê rewşê qezenceke mezin da destê Tirkiyê.

Rûsya ji bo berjewendiya xwe rejima Sûriyê xist nava xetereke pir mezin. Gelek leşker û serleşkerên Sûriyê hatin kuştin. Devereke weke Seraqib ku cihekî stratejîk e dîsa ket destê çeteyan. Halê hazir tevgera artêşa Sûriyê bi tevayî ji aliyê SÎHAyên Tirkiyê ve tê şopandin. Dema dixwaze jî bombe dike. Eger wiha Tirkiye leşkerên Sûriyê bikuje, çeteyan biparêze û herêmê di destê xwe de bigire, wê êrîşkariya wê û destwerdana li Sûriyê bibandortir bibe. Jixwe Israîl û Emerîka agahiyên istixbaratî û tevgera artêşa Sûriyê didan Tirkiyê. Piştî ku Rûsya jî destûra ÎHA û SÎHA da, di qada şer de hevsengî li dijî Sûriyê pêş ket. Her kes baş dizane ku artêşa Sûriyê lewaz bûye û hêza xwe winda kiriye. Beşeke mezin ji miletê wê bûye koçber. Beşek jê ne di binê kontrolê wê de ye. Ji ber wê di komkirina leşkeran de pir zehmetiyê dikişîne. Yên dibe leşkeriyê jî nikare bi têrayî perwere bike. Ku Tirkiye bi tang û topan jî êrîş dike, ji bo rejimê rewşeke xerab derdikeve.

Pir baş tê zanîn ku ji bo Erdogan ti pîvanên huqûqî, insanî û exlaqî nînin. Ji ber ku piştgiriya ji Ewropa dixwaze bi dest naxe, koçberên Sûriyê bi ser Yunanistanê de ajotin. Insanên bûyîn mexdûrên şer, wan dike çekên şerê xwe. Ji aliyê herkesî ve tê dîtin ka Erdogan ji bo Rojhilata Navî û Ewropa çiqas xeter e.

Ji ber ku rejima Sûriyê dane aliyekî, Yekîtiya Ereban jî nikare rolekî çalak bilîze û di nava xwe de parçe ye. Digel ku Rûsya li hemberî Emerîka û NATO bi kar tîne, Emerîka û NATO çavên xwe ji dagîrkeriya Erdogan re digirin. Digel ku êrîşî hewldana Rûsya ya ku Sûriyê li ser piyan bihêle dike jî, Rûsya hewl dide faşîzma Erdogan li cem xwe bigire. Bi kurt û cewher, Rûsya, NATO û Emerîka her tim dixebitin Erdogan li ser piyan bihêlin. Halbiku Erdogan nikare dîktaroriya li Tirkiyê ava kirî bi gel tevî bide qebûlkirin, hilbijartinan winda dike, li Sûriyê li pêşiya çareseriya siyasî kelem e, dibe sedem ku şer dewam bike û koçberî pirtir bibe. Digel ku rizgariya gelan ji Erdogan ji bo herkesî baş e û wê bibe sedema aramiya herêmê, yên weke Pûtîn û Trumap belayên weke Erdogan li ser serê gelan muselet dikin. Ji kuştina leşkerên Sûriyê, parçebûna Sûriyê jî di navê de di piraniya senaryoyên gengaz de, berpirsiyariya Rûsyaya Pûtîn heye.